
BERFANBAR 2025


KURMANCÎ

# BAJAR





ȘAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A AMEDÊ





KEKO

MEHLUQATÊN EŞREF





MESELA PÎREBOKÊ







EW QEHREMANÊ LI BER ŞERMA BAVÊ XWE RABÛYÎ

ZAGOR



Doğan Güzel
KEKO
KEKO ZANE LI HEV BÎNE
EHM, KEKO ABÊ TU WISA DIBÊJÎ LÊ...
HUŞ BE, EHMEQO! TU RABE JI BO TIŞTEKÎ BEREDAYÎ BI HEVALÊ XWE YÊ SALAN RE ŞER BIKE Û PAŞÊ JI BER KETIYE NAVBERÊ DEV BAVÊJE MÛRO. QEŞMER HEWALA! ÇÎZO MÎZO NIZANIM, GERE HÛN SIBÊ LI HEV BÊN. VA MIN NEGO!..
... HUŞ BE, EZ Ê BÊM ŞÎPELEQ. ÎTIRAZ MÎTIRAZ NAXWAZIM, TU Ê SIBÊ WERÎ Û BI DESTÊ MÛRO Û DAWÛDO BIGIRÎ. TE FAM KIR EHMEQ OXLÎ EHMEQ?
KUF... PIF
ARTÎZIYA MEKE OXLIM, DAWÛDO Û HEMÊ NIZAM HEVALÊN TE YÊN ÇEND SALAN E. JI BER ÇEND GOTINAN TU HEQEKÎ TE TUNEY E TU PÛŞTIYAN BIKÎ OXLIM! HEEEE GAVA TE XEBERDA LI NAV ÇAVÊ MIN MÊZE KE ÛLA!
JI XWE RE BAQIL BE, WEKÎ MIN GO SIBÊ WER WÎ CIHÎ Û LI HEV BÊN. HEGER TU NEYÊ HEYA YA!
HADÊ ÛLA BI DESTÊN HEV BIGIRIN... HADÊÊÊÊ! EZ JI KÊ RE DIBÊJIM ÛLA ARTÎZIYÊ MEKIN!
RAST E !
ARTÎZÊ ÇI ÛLA! BES TE ÊV QAS TIŞT GOTIN KEKO, EV ÇI TARZ E ÛLA!
ÇIII ?!...
NALET LÊ BÊ! JI NIHA Û PÊ VE AN EZ Ê TARZÊ XWE BIGUHERÎNIM AN JÎ EZ Ê JI DU KESA ZÊDETIR KESÎ LI HEV NEYNIM. SÊ KES PIR IN, QAWETA MIN TÊRÎ NAKE...
WE DÊHNA XWE DAYÊ, DAWIYA DAWÎ MÊRIK EM LI HEV ANÎN. ERIKKK!
XWEDÊ JI KEKO RAZÎ BE
OXXX, BÊHNA MIN DERKET YAW!


Doğan Güzel
KEKO
KARÊ BETALAN
HAHO, KA HELE LI BERÎTANA POZLÎÇIK BINÊRE. KEÇÊ LÊ, TU KÎNGA MEZIN BÛ LÊ! QOMÛTANA MALA BAVÊ MIN..
QOMTAN NA, HEMŞÎRE
ZIYARETA MALA APÊ MIN Ê XAYIN. GOTINÊN VALA, NESÎHETÊN ŞAŞ.
50 MILYON...
AX HECÎ AX, SÊ SALÊ DIN JÎ ÎDARE BIKIRANA 100 SALÊ XWE TEMAM DIKIR. FELEKA ZALIM...
YASEV
OOOF OF!..
ŞÎNIYA HECÎ QADIRÊ XIRIFÎ. EW QAS SAET SERÎ XWAR, RÛYÊ TAL LI ERDÊ NÊRÎN.
70 MILYON
LI DAWETA MALA ZILKÎFÊ HEYDO DE PERFORMANSA KOÇEKÊ YA PÊNC STÊRK
100 MILYON
ti-lî-lî-lî!...
TEW! TEWWW!
ERÊ WELLE, ÎRO JI XWE RE DARA TÛYÊ BIÇÎNE Û SIBÊ JÎ RABE TEMELÊ XANIYEKÎ BAVÊJE, NE?.. EV ÇI LÎSTIK E TU DIKÎ XALÊ MIN Ê GRÎNPEACE!..
WÎ KEKO, WELE TE ŞAŞ FÊM KIRIYE XWARZÊ
XWEDÎ-DERKETINA ERASEYÊN MALA BAVÊ BESÊ... GEREKE JI 500'Î KÊMTIR NEBE LÊ JI BO XATIRÊ DIYA MIN
200 MILYON
PÊNCÎ Û HEFTÊ DIKE SED Û BIST, SER DE JÎ SEDÊ DAWETÊÊÊ...
ÇAWA 250 MILYON TÊR NAKE KURÊ BÊFEDÎ!.. HIM KAR NAKE HIM JÎ LI KAR NAGERE ŞÛNDE JÎ PERÊ KU BAVÊ WÎ DIDE JÎ NAECIBÎNE BETALÊ BEREDAYÎ!..
TEW, MA EV JÎ PERE YE! 170 MILYONÊ DIN JÎ XÊRA XWE... HEGER DAN, DAN HEGER NEDAN ÎSTIFA DIKIM...

# TIRŞIK



LAN GURGO! EV HEYRANIYA TE YA YILMAZ GUNEY HEYE YA ÎMAN LI ME ÇIKAND. MA DI DAWETAN DE Û WÊNEYÊN DAWETÊ BÎNA FÎLMÊ "RÊ" BIN? MA JI HIRIYÊ BALGÎFA BERFÊ ÇÊ DIBE? TE BALGÎF NEHIŞTIN BALGÎF! MA TU YÊ SERÊ XWE DEYNÎ SER KEVIRA?
MISTO, GEREKÎ EYNÎ EW SAHNE BE. GEREKÎ DI BERFÊ DE JIN LI PAŞ Û BERF HÛR HÛR BIBARE. GEREKÎ EV WÊNE XELATÊ WERGIRE.
KURO SERXWEŞOOO QENALÊN BELGEFÎLMA MASIYAN DIWEŞÎNIN TEV WINDA BÛN. TU ÇI DIKÎ LI JOR? ZÛ BERÊ ANTÊNÊ BIZÎVIRÎNE.
KEÇÊ CA SEBIR KE ÛÛÛ.. VA DIZÎVIRÎNIM, Ê NIHA QENAL WERIN
OOX... ABÊ DEST Û PÊÇIYÊN TE TERR BIN. MASIYÊ MALABADÊ ÇI XWEŞ IN
HESO HÛN BI QEDRÊ XWEDÊ BIKIN DEV JI LÎSTIKAN BERDIN. ZÛ EM COTÊ XWE BIKIN BILA KAR NEMÎNE. EZ BETILÎM BI TENÊ ALÎ MIN BIKE LO
KURO HÊDÎ BAJO! LI PÊŞIYA ME ZINAREK QIRASE HEYE, TU ME NEKUJÎ!
NÊRGIZA MIN WELE JI TE PÊŞTIR TU KEÇIK NEHATINE MALA MIN. QEDRÊ XWE ZANIBE.
KIFŞ E KIFŞ. TU DIBÊ QEY LI VÊ GUR Û KÛÇIK PEV ÇÛNE. 12 LI MIN KETIYE, WELE EV KAR MEHKÎ JÎ XELAS NABE
WÎÎ EZ BI QURBANÊ KA BÊJE XALTÎ, BÊJE XALTÎ.
OXXX MEMMIK!
MEMIK Û MEMIK, HER TIŞT MEMIK. EV BÊNAMÛS NIZAM LI KÊ ÇÛYE?! JI MEMIKAN PÊŞTIR BI TIŞKÎ NIZANE, KUNDIRÊ KUNDIR
MIN QEYD KEVIN KIRIN JI HISRETA TE
BÊJE CINETIYO DÎSA BÊJEEE
MIN QEYD KEVIN KIRIN JI HISRETA TE
HAA HA! ÎCA ÇÊ BÛÛÛ
TE AHMED ARÎF BI ZIMANEKÎ PAQIJ QULIBANDIYE SER KURDÎ. EZ BI TE QAYIL BÛM. EZ ANCAX DIKARIM WISA BI TE QAYIL BIBIM
EZ NEXWEŞIIIM, QEY KES TUNE DERZIYEKÊ LI MIN BIXE?
TE EYB KIR HA! EZ BI XWE BI TEMAMÎ DERZÎ ME. KÎJANÎ DIXWAZÎ? A BIÇÛK A MEZIN? TU Û QÎMA XWE


AHA! DESMALA SOR DIHEJÎNE. WEY MIN DI TELAQÊ TE Û BAVÊ TE... MIN BERDIN, MIN BERDIN EZ QILOÇÊ XWE BIÇIKÎNIM QÛNÊ
XWESIYÊ TU ÎRO DEST Û PÊÇIYÊN XWE NEÊŞÎNE, MIN ŞÎVÊ JI DERVE XWEST. JI KURMIK NOQTE QOMÊ
OOO ZAVAYO! WELE ÎCA TU KETÎ ÇAVÊ MIN. XWEDÊ CIYÊ WÎ TIJE BIKE
CEMBELÎ ABÊ, DI PEVÇÛNEKÊ DE DERZIYA MIN ŞIKIYA. DIXTOR DERZIYEKE PROTEZ DA MIN. EZ Ê BI VÊ YA BI WAN VEDIM. LÊ GIRAN E HAA
ÊDÎ JI BOYÎ ZAROKAN JÎ BAR HEYE. ŞÎR BAR. WARÎLA ME JÎ ÇÊLEKA XALTIYA ŞÛŞANÊ YE...
LI SER TE NIHA ÇI HEYE DELALÎKA MIN?
TIŞTEK JÎ TUNEYE. ÇILPTAZÎ ME. EZ PIRÇIKANDIM Û WÊ MIN TÊXIN FIRNÊ. BÊNAMÛSO TU DÎSA ÇÛYÎ BA KÎJAN ORISPIYÊ?
TU ÇIMA TÊYÎ MEHLA ME Û DÎKÊN MEHLÊ JI RÊ DERDIXÎ SUSLÎ XANIM! WELE EM MIRÎŞKÊ VÊ MEHLÊ HEMÛ BIBIN YEK Û EM Ê TE PIRTÎPIRTÎ BIKIN. BICEHIME ZÛ JI VÊ...
TU BIBELQITÎ CANO. TU BI QURBANA KURÊ XELKÊ BIBÎ. KU MÊVANEK BÊ CIYÊ RÛNIŞTINÊ TUNE DI MALA ME DE. TU LI MALA KOZO BINÊRE Û LI MALA ME BINERE. MALA WÎ EYNÊ SERAY E.
ODEYA MIN BÎNA ODEYA DAYIKA MIN NÎN BE JÎ ÎDARE DIKE KEKO. EV ABÊ KIRÊ MIRÊ JI MIN NASTÎNE. XWEDÊ EMRÊ WÎ DIRÊJ BIKE. ZILAMEKÎ BAŞ E
KENGÛRÛ


MESELA PÎREBOKÊ
Şêxmûs Çîçek
HI-HI!... EV ÇI VÎDEO YE ÎCA
HMMM, ÛLA FAŞÎSTA BÊŞEREF!
BISMILLA.. KEÇÊ DÎNÊ EV ÇI POZ E...
HIII?!...
XÊRE 'ABLA' ÇI BÛ?...
CIZRT!
EZ NE 'ABLA' ME Û BI TIRKÎ JÎ NIZANIM, KERÊ XWEDÊ
AY BISMÎLA !...
Ç..ÇI PÊ HAT, TELEFONA SPÎSAXLEM?
?!...
XOOOOL!
KERÊN ÇOLÊ
TREEEQ!
HAHO !..
ANNE !...
JI SIBÊ HETA ÊVARÊ LI BER VAN TIŞTONEKAN... EHMEQÊN EHMEQ!



ÊDÎ NE DIYA XWE NAS DIKIN NE PÎRA XWE NE JÎ...
CIRZZ!
HII?!...
ÊÊÊ!... TU PÎRA.. PÎRA...
WÎÎÎÎ BERXIKO. DERKETIYE NAN BIKIRE JI BO MALA XWE, NE?... ALÎ DIYA XWE DIKE EV KURIKÊ BAQIL. HEYRAN...
BERÎ KU TARÎ BIKEVE ERDÊ VEGERE CEM DIYA XWE AN JÎ EZ Ê ROVIYÊN TE DERXIM Û TE BI WAN VE DALIQÎNIM, DERÎ?
D... DA...
DI VÎ ZEMANÊ XERAB DE ZAROKÊN WEK TE NEMANE JI XWE. GIŞ BELA VAN TIŞTÊN...
DAYÊÊÊ!...
...TIŞTEN ŞEYTANOKAN. MALA ŞEYTANOKAN..
ÊDÎ DAYIK GEDÊN XWE BI VÎ XANIYÎ DITIRSÎNIN HA?
DE VEBE!
TIRS ÇIYE HÛNE FEHM BIKIN ÎŞEV...


CRZZZ!!..
BICEHIME ŞEYTANOKA HERAM! BICEHIME !...
GURM!..
JAR TÊKEVE! DISA ELEKTRÎK ÇÛ...
EVCAR TRAFO TEQIYA..
KEÇÊ RABE WÎ TIŞTÊ VÊXE!
...MA QEY ŞANSÊ MIN E. TAM LI SER DÎZÎYA MIN CEREYAN QUT BU.
ÇI XWEŞ... DÎSA BÛ WEK ZEMANÊN BERÊ
ZÛ KEÇÊ... MÛMÊ BÎNE Û HERE DERÎ VEKE.. LI DERÎ DIXIN...
VEKIIIN! ZÛÛÛ KEÇÊ ZÛ...
TEQ! TEQ!
NA.. NA.. BILA MESELÊ HÛTAN BÊJE. Ê BI GEPEKÎ DE KARE SÊ ZAROKAN BIXWE...
NA LO, BILA Ê PÎREBOKAN BE. ÇAWA HER ŞEV TÊ DIKEVE KADÎNA MALA BAVE MUKRÎ U WAN MIRÎŞKAN ŞERJÊ DIKE...
LI GOR WÊ TEQÎNIYÊ, CERYAN WÊ ZÛ BI ZÛ NEYÊ. TÊRA XWE WEXTÊ ME HEYE ÎŞEV. EZ Ê HIM MESELA HÛTAN HIM JÎ PÎREBOKA MALA XALTIYA MIN QOP BESNÊ BÊJIM. ÇAWA JI QEHRA LI DÛ XALTIYA MIN ÇÛ BAJÊR Û ÇAWA WÎ HER SÊ QÎZ XAPANDIN Û BI XWE RE BIR MALA XWE YA DI HUNDIRÊ TENDÛRÊ...
KEÇÊ BERFO, MIN LI DERVE TIŞTEK WER ECÊP DÎT KU. EYNÎ MÎNA..
HUŞŞ LO, PÎRÊ WÊ JI ME RE MESELÊN PÎREBOKAN BIBÊJE. PÎREBOKA MALA BAVÊ MUKRÎ...

Dawi



1970-Berga hejmara ewil a ji Weşanên Tayê derketiye.




# ZAGOR
# EW QEHREMANÊ LI BER ŞERMA BAVÊ XWE RABÛYÎ



Gava ew zarokê ku qalikê zebeşan ji heqîba li ser milê xwe derdixist û digot "Ahyaaaak" û qalikên zebeşan davêt hevalê xwe... Gelo ev dîmen çi dianî bîra gelê Çewlîgê? Helbet niha fêm kirine ku ev lîstikeke şerî ye. Lê bi ya min li wê tewşikî mewşikiyê tu wate bar nekirine. Ma wê ji ku bizanîbana ew qîrîna seyr û ecêb a qehremanekî xêzeromanê ye? An jî ji dêvla balteyê kevirî qalikên zebeşan dadikirin? Ma wê ji ku bizanîbana qehremanên ku gelek caran hewl dane ew balteyê kevirî yê kevnare çê bikin, lê ji heq derneketine? Ên hebikekî şubh pê xistibin jî, di pekandina ewil de bi xembarî bûne şahid ku ka balteyên wan çawa li erdê ketine û bûne kafirkeratî.

Em zarokine wisa bûn ku ne ji ekranên biçûk an jî ji ekranên mezin, bi saya cîhaneke dubûut a xêzeromanê me qehremanên wan nas kirin. Ji ber vê yekê piraniya qehremanên me yên ewil hem bêbûut hem jî ne dorfireh bûn, karakterine hêsa bûn. Nizanim belkî jî em bi qasî ku qehremanên xwe fêm bikin ne xwedî tecrûbe bûn. Madem em bi qasî ku êdî qalikên zebeşan navêjin mezin bûne, nexwe em dikarin ji nû ve qehremanên xwe nas bikin, ne wisa?

Navê qehremanê me Zagor e. Sergio Bonelli û Gallieno Ferri, di sala 1961'ê de bi hev re afirandine. Li gorî gelê Çermsor jî Zagor Te-Nay e. Di zimanê Çermsoran de "Te-Nay"; Yezdanê Bibalte ye. Bûyer, di sedsala 19'an de li bajarokeke xeyalî ya Amerîkayê, li daristanên bajaroka Darkwoodê diqewimin. Zagor, kesekî qamdirêj, por reş û kurs, çeleng, birûpêl, masûlkedar, bi hêz û quwet û çist e. Gomlekekî sor î bêmil û resmê eyloyan (qertel) li ser heye. Her çi qas tu wateyekê li wan rîşikên li kêleka gomlekê wî yên bi ser milên wî yên tazî ve daliqîne bar nekim jî, lê girîngiyê bi sembola eyloyê didim. Lê kifş e, bi îmaja eyloyê ku ji bo civakên pirxwedaperist tiştekî pir xusûsî ye, xwestiyetesîreke mezin li Çermsoran bike û wekî sembola otorîteyê bi kar bîne. Mesela di Tex de jî heman rêbaz bi kar aniye û navê Eyloyê Şevê û heman sembol bi kar aniye.


Li kêleka rastê ya qayîşa wî balteyekî kevirî yê gilover bi benikan ve bi şivekê hatiye girêdan û li kêleke wî ya çepê jî demançeyeke bitopik heye. Balte, çekeke kevnar a Çermsora ye; demançe jî çekeke nûjen a çermspiya ye. Zagor, bi vî awayê çekgirêdanê dixwaze rola xwe ya terazîner a di navbera her du çandan de bide ber xwendevana. Tişta ji rîşikên gomlekê wî jî bêwatetir, pantorê wî yê teng î şîn e ku dawiya qûna wî gilover û spî ye. Di şer û lecên herî bi hêcan de jî ew pîneya spî li ber çavê me dikeve. Lê belê hê jî em nizanin ew pîne ji ber çi bi wir ve hatiye vekirin.




Yezdanê Bibalte Zagor, hela bêje ev çi ye?



Zagorê biçûk, ligel Fitzyê Nêçîrvan li ser gora malbata xwe.




Lê em dev ji bejnûbala wî berdin û berê xwe bidin destpêka çîroka efsaneya Zagor; Berî ku navê Zagor lê bê kirin, navê wî yê ewil Patrick Wilding e. Tevî malbata xwe ya ji Îrlandayê, li daristanekê bi bextewarî dijî. Hê gava zarok bûye bi pêşengiya çermspiyekî bi navê Salomon, Çermsorên Abenakî êrîşê dibin ser mala wan û dê û bavên wî dikujin. Lê bavê wî, berî ku bê kuştin Patrick davêje çem. Nêçîrvanê bi bernavê Fitzy, Patrickê êtim ji çem xelas dike û wî wekî şervanekî mezin dike. Gava Patrick, dibe ehlê şoxulandina çek û balte û bi qasî ku karibe heyfa xwe hilîne mezin dibe, qebîleya Abenakî ku malbata wî kuştibû dibîne û gişan dikuje. Şefê




Gava Zagor, bi wê qîrîna xwe ya ecêb aqil ji serê Çermsoran dibe.

qebîleyê Salomon, berî ku bimire li xwe mikur tê û ji Patrick re dibêje, bavê te leşkerekî kuştarê Çermsora bûye û loma ew kuştine. Di êrîşê de Fitzy dimire. Zagor, dîsa êtim dimîne û bi rêyan dikeve. Û malbata Sullivan nas dike ku ev malbat malbateke cambaz e. Ji Sullivanan dersên akrobasiyê, navê Zagor û gomlekê xwe yê sor î resmê eylo li ser digire û diçe serdana Çermsorên Darkwoodê. Bi hin lîstikên dûman û ronayiyê tesîrê li Çermsoran dike û dike ku Çermsor jê bawer bikin ku nîvxweda ye. Bi vî awayî navê Zagor Te-Nay lê tê kirin û dibe parêzgerê gelê Çermsor.

Helwest û nêrîna kolonyal a xêzeromana wê serdemê di vir de jî xuya dike; Çermsor, bi qasî ku nikaribin xwe bi rê ve bibin cahil û hoveber in, pêdivî bi pêşengtiya çermspîyekî dibînin. Ji xwe Salomonê ku malbata Zagor kuştibû jî pêşengekî çermspî bû. Bi qasî tê fêmkirin Zagor, ji ber ku kurê bavekî kuştar e û ji vê kirina bavê xwe

Çîko



şerm dike, ji bo ji vê şermê xelas bibe dibe parêzgerê gelê Çermsor. Wisa xuyaye nivîskarên wî qîma xwe bi vê jî neanîne û ji bo Zagor hesab bi bavê xwe re bibîne, radibin serpêhatiya bi navê “Zagor Li Hemberî Super Mike” dinivîsînin. Di vê serpêhatiyê de, Zagor û zilamekî hêzdar û atletîk ku mirov dibê qey ji nav xêzeromanên Amerîkî derketiye, li hev didin. Li ser vî zilamê ku dixwaze teqlîdê Zagor bike û şûna wî bigire, gomlekek heye û li ser sînga wî tîpa M heye. Navê qehreman Super Mike ye. Hela li vê tesadufê mêze bikin; navê bavê Zagor jî Mike ye. Musabeqeya wî û Super Mike, li ber çavê Çermsoran pêk tê û Zagor têk diçe. Musabeqeya wan a dudoyan, bi şahidiya heyeteke ji efserên artêşê pêk tê û vê carê Zagor Super Mike têk dibe. Super Mike, her çi qas bi hêla xwe ya fizîkî neşibe bavê Zagor jî, lê egoya wî ya alterî ye. Zagor, di vê serpêhatiya xwe de li ber çavê kesên fermana kuştinê dabûn û mexdûrên kuştinê, bavê xwe têk dibe û hesabpirsîna xwe pêk tîne. A rast ev musabeqe û leqayîhevhatin, di asasê xwe de merasîmeke pakbûn û paqijbûnê ye.

Ji ber bikostum (bicilûberg) e nêzî terzê qehremanên xêzeromana Amerîkî ye, lê di asasê xwe de tam karakterekî xêzeromana Îtalî ye. Celebekî durehî (qirma) ye. Vebêjiya ku bi awayekî klasîk î western dest pê dike, di serpêhatiyên din de dibe ku veguhere celebên tirs, fantastîk, honaka zanistî û komediyê. Ji bo parastina aştiyê geh kulmên xwe geh jî çekên xwe dişoxulîne. Gava vê yekê dike jî nabêje ev çermspî ye an jî xwecihî ye. Heger di navberê de oqyanûs tunebe, sekin jê re tuneye ji vir diçe wir ta ku bigihê cihê xwe. Bi zêrên li qeraxên çeman berhev dike, debara xwe dike. Wekî qehremanên xêzeromanên serdemê hemûyan, têkiliya wî ya bi jinan re jî ji maçeke şermoke wêdetir nîn e. Di heyata wî de gelek jinên xweşik hene, lê di dawiya her serpêhatiya xwe de bi dostê xwe yê şîşko yê Meksîkayî berê xwe dide qulûbeya xwe.

Di çirava li Darkwoowê de, tevî dostê xwe cirxweş Çîkoyê şîşko li qulûbeyeke nekonfordar dijî. Çîko ku ji xeynî xwarinê tiştek nayê bîra wî, keseke sadiq, îtaetkar, tirsonek û bêkêr e. Bi van xusîsiyetên xwe tenê unsûreke komediyê ye. Di helkirina bûyeran de ne xwedî roleke tesîrdar e. Ev kesê Meksîkayî ji bo wekî Çermsoran bijî, pêdivî bi vî çermspiyê Îralndî, yanî bi Zagor dibîne. Hevalên Çîko jî eynî wekî wî ne an bêkêr in an jî bibela, ecêb û komîk in. “Billê Bêr û Tevir” ku tim li

Zagor li hemberî Super Mike



xezîneyan digere, postecî Drunky Duck ku nameyan tîne qulûbeya wan î li Darkwoodê?!. Bise bise, deqakê?!.

Drunky Duck. Dêmeg navê postecî werdeka serxweş e ha?.. Himm.. Hela em lê hûr bibin: Zilamê me li qulûbeyek di nav çiravê de, tevî Meksîkayiyeke qamqutik û komîk dijî. Bi balteyekî kevnar, gomlekekî sor





Bi ya min bilûra di dest Drunky Duck de ne vala ye.


î birîşik û pantorekî pişt qûna wî bi pîneyên spî û ji wir diçe wir. Bi ser de bi awayekî tewşomewşo diqîre, dibêje “Ahyaak” û xwe wekî nîvxweda dibîne. Ji xwecihiyan bigire heta rêbiran, ji xwînmijan heta şeytanqûniyan, ji eşqiyayan heta fezayiyan gelek dijminên wî hene. Tenê seredanekî wî heye ew jî posteciyê bi navê werdeka serxweş e. Ma hûn dibên li vê çiravê ev qas dijminê wî çê bûne? Ez dibêm Werdeka Serxweş torbeciyê Zagor e. Aha! Me bi salan çîrokên ku ji serê bidûman ên du hevalan derketine xwendin. Gelo ma wekî din tu îzahiyateke vê ecêbiyê heye?



Ev jî Çîkoyê Îmam Cîcî



ZAROKÊN NEMRÛD
MAMO
MALÛM E CAR HEYE ECELEYA MIROV ÇÊ DIBE. LÊ DI RÊ DE TU LEQAYÎ NASEKÎ TÊYÎ Û TU NE DIKARÎ XWE JÊ BIGIRÎ NE JÎ XWE TEV BIDÎ. BIFIKIRE HER DERÊ TE KIRINE CEBARÊ, AHA BÊÇARETIYEKE BI VÎ RENGÎ. DEV JI REVÊ BERDE, TU NIKARÎ GOTINA WÎ JÎ BIBIRÎ. WÊ KÊLIYÊ JI XEYNÎ NALETLÊANÎNA LI ŞENSÊ XWE TIŞTEK JÎ JI DESTÊ TE NAYÊ. HA WEZIYETA ZAROKÊN NEMRÛD JÎ EV WEZIYET BÛ.
ÊN XEBER DIDIN NE TÊ DE, HEMÛ LI SER HEMAN TIŞTÎ HÛR BÛBÛN..
ÎCA EV ÇI YE? LEBLEBÎ YE ÇI YE DI NAV DESTÊ TE DE?
ERÊ LEBLEBÎ YE. HEGER TU DESTÊ MIN BERDÎ EZ Ê HINEKÎ BIDIM TE.
?!
?! ÇI?
OFF OFF! XWEDÊ RUHÊ ME BISTENDA Û EM JI XWE RE XELAS BIBÛNA...
DU ROJNAMEVANÊN LALÛTE, HER DU JÎ BETAL Û BÊPERE. GAVA WISA BÊÇARE BÊÇARE DOŞ DIBIN, LEQAYÎ ROJNAMEVAN BÛRHAN FELEG TÊN. BI HÊVIYA KU KAREK BI DEST WAN BIKEVE DIÇIN CEM WÎ. WÊ DOZA KAR LÊ BIKIN. BI KEKEKERIN Û KUKUKIRINÊ, DIBÊJIN HEGER NÎV SAET WEXTÊ TE HEBE EM DIXWAZIN TIŞTEKÎ JI TE RE BÊJIN. AHAHA HAA.. AAAAHHH!.. XÊR E ÇI DIBE??.. DIKEV...
EBELE OBE HO XE...
ELE EBELE LO LEG EHELU LO!
ÇÊRÊN PÎS DIKE. LEWMA EZ Ê VIRA WERNEGERÎNIM, LI QISÛRÊ MENÊRIN!
QEDEREKÊ XWE KERR DIKIN. JI WE TIRÊ ZEWQÊ JI BÊDENGIYÊ DISTÎNIN NE WISA? NA, HÛN XAPIYAN...
XWEHÊ, TU QET LÊ FIKIRIYÎ? HEGER EM NE YEZDAN LÊ MIROV BÛNA ME YÊ ÇI BIKIRA?
NA QURBANO.
JI XWE TE BIGOTA ERÊ, EZ Ê HEYR BIMAMA. MIN JÎ GO, QET NEBE EM Ê JI XWE RE PIŞTA ÇEND GOTINA BIŞKÎNIN.


EZ Ê BIBÛMA ASTRONOT BIRAKO. HELA JI XWE RE BIFIKIR, DI HEYATA XWE DE TENÊ EZ Ê CAREKÊ BIÇÛMA HÎVÊ Û JÊ PÊ VE RAZÊ BAVÊ MIN RAZÊ...
NIZAM ÇENDIK Û ÇEND HEZAR SAL E TU LI VIRA RADIKEVÎ, HÊ JÎ DI ETRA RAZANÊ DE YÎ, HELAL BE JI TE RE WELE.
EZ Ê JI XWE RE BIBÛMA HEYKELTRAŞ. MIN Ê JI XWE RE WECHEKÎ XWEŞIK Û GEWDEYEKE XWEŞIK ÇÊ BIKIRA.
WELE TU YÊ BIBÛNA JINEKE WEKÎ KEVIR HA! AHAHA HAHAH HA HA!
BÊEDEBÊ BÊEDEB. EZ DI EMRÊ DIYA TE DE ME, BI DEBA DEVÊ XWE ZANIBE!
PARDON XWIŞKÊ. MIN HENEK KIR...
EZ Ê BIBÛMA NIVÎSKAR.
TIŞTEKÎ AQILANE...
EZ Ê BIBÛMA DÎROKZAN.
EV MAQÛLTIR E.
EZ Ê DÎSA BIBÛMA XORT.
!?
TU KÎ YÎ LA?
!?
LI QISÛRÊ MENÊRIN ABÊ. HEMA JI NIŞKAVE DAXILÎ NAV CIVATÊ BÛM. SELAMIN-ELEYKIM..
ALEYKUMSELAM, LÊ TU DOZA ÇI DIKÎ CANO? TE MÊZE KIR, TÊ TEMAŞE JÎ KIR, NEXWE HERE LI ÎŞÊ XWE MÊZE!
EZ DIXWAZIM ÇEND GOTI-NAN BIKIM, BAWER IM HÛN Ê GUH BIDIN VÎ BIRAYÊ XWE?
WELE BIRAKO HEGER HEVOKÊN TE KIN BIN EM Ê KÊFXWEŞ BIN. MESELA BI QASÎ QAMA XWE BIAXIVE.
AAAHA HA HA HA HA!
BINE TU MEZINÊ MIN Î, NAXWAZIM EM DILÊ HEV BIHÊLIN. TU XWEDÊ KA EV GOTIN LI QILAFETÊ TE TÊN?
LAW MIN JI TE RE NEGO BI HEVOKÊN DIRÊJ XEBER MEDE? DEYNE, DEY-NE WÎ DESTÊ XWE!
TEMAM ABÊ. BILA WEK TE BE. EZ Ê KIN LÊ XIM. PIRSIYAREK MIN Û LI GOR BERSIVA WE JÎ XWESTEKEK MIN HEYE. JI BO ESEHIYA VÊ YEKÊ HÎN BIBIM HATIME; JI WE RE DIBÊJIN YEZDAN, GELO RAST E?
HELBET EM YEZDAN NIN. ÎCA EM Ê ÇI BIN?



ÊWELEH, HÛN HER HEBIN. MIN CEWABA XWE GIRT. NEXWE LI VÊ DINYAYA BIKUTIM TEMELÊ WÊ, ÇI HATIBE SERÊ MIN SEBEBÊ WÊ HÛN IN, HE? QET NE XEM E...
HETA VIR SERÇAVA. LÊ QET NEBE MIN Û YARA MIN BIGIHÎNIN HEV. WEKÎ DIN TU TIŞTÎ JI WE NAXWAZIM. EZ EYŞÊ DIXWAZIM. WÊ BIDIN MIN.
DIBE, WEKÎ DIN?
SIBHANELA, ÎCA DÎN JI ME KÊM BÛN. HELA TU LI VÎ MANYAXÎ MÊZE YAW. HADÊ OXLIM, TU JI KU HATIYÎ BIÇE WIR HADÊ.
DÎNÊ ÇI ABÊ, AŞIQ AŞIQ..
HEM JÎ AŞIQEKÎ WISA YE KU JI BO BIGIHÊ YARA XWE, DIZANE XWE BAVÊJE BEXTÊ YEZDANAN...
!
?
?
TEW MEYDANXWESTINÊ JÎ DIZANE..
?
!?
AN RUHÊ MIN BISTÎNIN AN JÎ YARA MIN BIDIN ÛLAAANN!
LAAN BISEE!
AHA LEWYE KIŞAND. ABÊ BI XWEDÊ HEB XWARINE Û HATIYE.
YA HÛN Ê BIDIN... AN JÎ A JI WE RE
AN HÛN BIDIN, AN JÎ A JI WE RE, AN HÛN Ê BIDIN AN JÎ A JI WE RE...
JI WE LA. A JI WE LA... A JI WE, A JI WE...
ÇIMA WE EYŞEYA MIN NEDA HE? MADEM HÛN NADIN, ÎCA ÇIMA HÛN RUHÊ MIN NASTÎNIN ÛLAAAN?
AX!
OFF!
AXX!
OFF HUUH HUHHH HUHH... BETILÎM, NEMAM.
EM HINEKÎ GERM BÛN NE WISA? BI XWEDÊ SER ÇAVÊ MIN DIŞEWITE.
HUŞ BE LA. JI XWE NIKARIM ÇENA XWE BILEQÎNIM AXX.. OFFF
DEST NEDA MIN, GUNÊ WÎ BI MIN HAT. WELE EZ XWEŞBEXT IM..
HUŞ BIN LA! BISE BILA CIXARA MIN BIQEDE BÊ EZ ÇI DIKIM JI WE.



BAJAR